

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

**VEKOLÎNA ÇÎROKEKÊ LI GOR EDEBIYATA
ZAROKAN**

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Zeki TEMEL

13721252

Şewirmend

Ramazan PERTEV

Mêrdîn - 2016

Mêrdîn - 2016

NAVEROK

Naverok.....	1
Kurte.....	2
Özet.....	3
Destpêk.....	4
Rêbaza Vekolînê ya li ser Berhemên Zarokan.....	5
MÎŞKÊ DEŞTÊ – Çîrok.....	6
A- Kurteya Çîrokê.....	7
B- Vekolîna ziman û uslûba Çîrokê.....	7
C- Vekolîna Piştgirîya wê ya li ser geşedana zimên.....	9
D- Vekolîna Naverokê.....	9
E- Vekolîna Peyama Çîrokê.....	11
F- Vekolîna peyv û komepeyvan.....	11
1- Ji aliyê Lêkeran.....	11
a- Lêkerên xwerû/sade.....	11
b- Lêkerên hevedudanî.....	11
2- Ji aliyê Navdêran.....	12
3- Ji aliyê Rengdêran.....	12
4- Ji aliyê Gihanekan.....	13
5- Ji aliyê Daçekan.....	13
6- Ji aliyê Cînavkan.....	14
7- Biwêj û Gotinên pêşyan.....	15
8- Awayê Peyvan li gorî fêrkirina zimanê kurdî.....	15
a- Ji aliyê geşedana çandî ve.....	15
b- Ji aliyê asta fêmkirinê ve.....	15
G- Nirxwandina Giştî.....	16
H- Ji nû ve Sazkirina Metnê.....	16
Encam.....	17
Çavkanî.....	18

Kurte

Di vê xebatê de eme bi awayekî zanistî li ser çîroka *Mişkê Deştê* rawestin. Li gor fêmkirina zarokan ji aliyê ziman û uslûbê, feydeya geşedana zimanê zarokan, naverokê, peyamê û peyvan ve hete ji dest me tê eme çîrokê ron bikin, rexne bikin û pêşnîzarê xwe bidin.

Herwiha ev xebat yê ku pirtûkê zarokan distînin û dixwînin re bila rêberîyeke serkeftî bike.

Bêjeyên Sereke: *Çîrok, pirtûkê zarokan*

Özet

Bu çalışmamızda *Miškê Deştê*(Ova Faresi) masalı üzerine ilmi bir çalışma yapacağız. Çocuğun anlayışına göre masalı dil ve üslup, çocuğun dil gelişimine katkısı, içerik, mesaj ve kelimeler yönünden elimizden geldiği kadar analiz edeceğiz ve önerilerimizi sunacağız.

Ayrıca bu çalışmanın çocuk kitaplarını alan ve okuyanlar için iyi bir rehber olması dileğimizdir.

Anahtar Kelimeler: *Masal, çocuk kitapları*

Destpêk

Edebiyata zarokan; berhemên ji zarokan re ku emirê wan di navbera 2-14an de ne, hatine nivîsandin e. Berî her tiştî divê berhemên zarokan edebî bin ku zarok ji berheman hez bikin, asta fêmkirin û ecibandinên wan bilind bibin.

Çîrok di nav berhemên zarokan de ên herî çalakin. Bi saya çîrokan hişmendiye zimên, adet û toreyên neteweyî, helwestên qenc û xerab, ehlaqekî baş tîn dayîn. Helbet ji van xusûsiyetên girîng re berhemên baş ku ji aliyê fêmbariyê ve divê zelal be, pêwist e.

Nivîskar Selman Dilovan li ser çîroka wiha dibêje: “Eger mirovek ji bo zarokên kurmancan çîrokan binivîse û peyvên soranî bi kar bîne, ezê xatir jê bixwazim. Çimkî divê mirov ne li gorî xwe, li gorî dile zarokan binivîse, da ku bala wan bikişîne. Eger zimanê çîrokekê ne li gorî dile zarokan be, mijara wê çiqas balkêş jî be, yê zarok jê aciz bibin.”

Ji aliyên pêşketina geşedana zimanê zarokan, zêdekirina repertuara bêjeyan û ji bo peydakirina zarokên xwîner ên serkeftî, divê meriv ji berhemên zarokan nemaze ji çîrokan sud werbigire. Herwiha zarokên ku ji xwandinê hez dikin ji aliyê zimanê xwe yê zikmakî ve hîn pêşve diçin.

Ev çîroka ku em li ser dixebitin ji cureyên çîrokan ên fablî ne ango cureyên çîrokan ên ajalan. Ev cure bêhtir dîdaktîk in. Ji ber ku lehengên van çîrokan ajal in û wek merivan dipeyîvin, zarok meraq dikin, diqetê zarokan dikşîne, û kêfê zarokan pê tîne. Zarok xisletên muhîm qezenç dikin û bixwebawer dibin.

Lê belê ew feydeyên çîrokan vegotîneke sade û zelal dixwaze. Divê seranserî metnê lihevkerî û ji aliyê sentaksê ve rêkûpêk be. Herwiha dirêjîyên hevoka li gorî asta zarokan be.

Ji bo numûne be çîroka *Mişkê Deştê* ji aliyên naverokê, zimên, sentaks û peyvên ve li gorî fêmbariya zarokan eme tehlîl bikin.

Rêbaza Vekolînê ya li ser Berhemên Zarokan¹

- A- Kurteya Çîrokê
- B- Vekolîna ziman û uslûba Çîrokê
- C- Vekolîna Piştgirîya wê ya li ser geşedana zimên
- D- Vekolîna Naverokê
- E- Vekolîna Peyama Çîrokê
- F- Vekolîna peyv û komepeyvvan
 - 1- Ji aliyê Lêkeran
 - a- Lêkerên xwerû/sade
 - b- Lêkerên hevedudanî
 - 2- Ji aliyê Navdêran
 - 3- Ji aliyê Rengdêran
 - 4- Ji aliyê Gihanekan
 - 5- Ji aliyê Daçekan
 - 6- Ji aliyê Cînavkan
 - 7- Biwêj û Gotinên pêşiyar
 - 8- Awayê Peyvan li gorî fêrkirina zimanê kurdî
 - a- Ji aliyê geşedana çandî ve
 - b- Ji aliyê asta fêmkirinê ve
- G- Nirxwandina Giştî
- H- Ji nû ve Sazkirina Metnê

¹ Zeki Gürel, Fahri Temizyürek, Namık Kemal Şahbaz, Çocuk Edebiyatı, Öncü Yayınları, Enxer, 2007, rr.258-259.

MIŞKÊ DEŞTÊ²

Li deşteke mişkek û malbata xwe dijiyan. Mişk bi çi kul û halî be, debara mala xwe dikir û zarokên xwe xwedî dikir.

Çi bû çawa bû; belayek hat serê mişkê deşte. Mişkê feqîr nizanibû ku çawa bike û ji vê belayê xelas bibe.

Mişkê deşte fikirî, fikirî. Di carekê de pismamê wî yê ku li çiyayî dijiya, hat bîra wî. Mişk ji xwe re fikirî û wiha got; -Ez ê herim cem pismamê xwe. Heke xelas bike, dê ew me ji vê belayê xelas bike.

Mişkê deşte berê xwe da çiyayî û bi roj û şevan meşiya.

Dema ku nêzîkî malê bû, dît ku pismamê wî ber pê tê.

Pismamê wî bi dîtina wî gelek kêfxweş bûbû. Mişkê çiyayî û mişkê deşte gihîştibûn hev. Piştî ku hev û din hembêz kirin û li hal û xatirê hev û din pirsîn, derbasî malê bûn.

Her du mişkan ji xwe re xwarin amade kirin, li ser sifreyê rûniştin û xarina xwe xwarin.

Mişkê çiyayî ji pismamê xwe pirsî; -Te xêr e pismam? Tu û van deran? Wisa xuyaye ku tişteki nebaş qewimiye.

Di vê navberê de zarokên mişkê deşte ji tirsan nikarin ji cihê xwe bilivin. Ji ber ku bavê wan çûye, newêrin serê xwe jî ji nav derî derxin.

Piştî ku mişkê çiyayî li rewşa pismamê xwe dipirse, ew tirs dikeve nav dilê mişkê feqîr û dibêje; -Qet nepirse pismam! Belayeke wisa hatiye serê me ku Xwedê neyne serê neyarê min jî.

Pismamê wî yê çiyayî wekî ku ji tu tişteki natirse tevdigere û jê re dibêje; -Ew çi ye ku pismamê min ditirsîne? Ka bibêje! Heke şêr be ez wî bipelêxim! Heke ker be ez guhên wî jêbikim! Heke gur be ez diranên wî hilkişînim.

Mişkê deşte dibêje; -Na na pismam ne yek ji wan e jî. Tu bi min re were, ezê wî nîşanî te bidim. Her du bi hev re dikevin rê û ber bi mala mişkê deşte ve diçin. Piştî çend rojan digihîjin malê. Dema ku zarokên mişkê wan dibînin, gelek kêfxweş dibin.

Her du bi hev re li ser sifreya xwarinê rûdinên ku firavîna xwe bixwin, bi carekê gurmegurm ji erdê diçe. Her du jî li hev şaş dibin. Mişkê deşte ji pismamê xwe yê jêhatî re dibêje; -Pismam! Bi Xwedê hat! Mişkê çiyayî dibêje; Ka ti nîşanî min bide ku ez çawa ji heqê wî derdikevim.

Her du derdikevin derve, dibinin ku garanek ji wir ve tê. Mişkê çiyayî dipirse; -Ev in? Mişkê deşte dibêje; Na, ne ev in!

² Weşanên Aram, Mişkê Deşte, Stenbol, 2012.

Dûre keriyê pezî ji wir ve tê. Dîsa dipirse; Evin pismam? Mişkê deştê dibêje; -Na na, ne ev in!

Di peyî keriyê pezî de şivanek derdikeve û pisîkekî gewr jî pê re ye. Mişkê deştê dibêje; -Ha ha! Pismam ev e! Mişkê çiyayî çavên xwe digire, direve û dibêje; -Pismam min tiştê nedîte! Çîroka me li diyaran, rehmet li dê û bavên we guhdaran.

A- Kurteya Çîrokê

Li deştê mişkek û malbata xwe dijiyan. Belayek hat serê mişkê deştê. Ji bo ku belayê xelas bibin mişkê deştê diçe cem pismamê xwe yê çiyayî dijiya. Meseleyê ji pismamê xwe re dibêje. Pismam jî dibêje ti nîşanî min bide eze çareser bikim. Her du bi hev re dikevin rê û diçin mala mişkê deştê. Piştî çend rojan bela derdikeve holê û mişkê deştê wî nîşanî pismamê xwe dide. Pismam ku belayê dibînê xwe lê nake xwedî, ditirse û direve.

B- Vekolîna ziman û uslûba Çîrokê

Di çîrokan de divê ziman xwerû û herikbar be. Gorî zarokan be. Ji bo ku kêfê zarokan pê werin mijara çîrokê çî dibe bila bibe pêwîste ku nivîs fêmar be.

Vegotin, paqij û rewan be; dirêjyên hevok û paragrafê divê ji bo salên zarokan guncan be. Divê ziman hêsan û xwezayî be, tehma zimên jê were û hezkirina zimên û pêşxistina hişmendiya zimên divê karibe.³ Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mizah û îronî be divê zarokane be. Bi taybetî jî zimanê kitêbê divê xwerû û zelal be, peyvên biyanî tê de hindik bin û hevokên xwe li gor muxatabê xwe bin.⁴

Çîroka Mişkê Deştê ji aliyê ziman û uslûbê ve ku em vedikolin hinek kêmasî derdikevin holê. Van kêmasiyê ku me tespît kirin em li jêr analiz bikin.

Berî her tiştî em bala xwe bidin ser hevoksazî/sentaksê. Di çîrokê de 46 hevok hene. Pîrî hevokan dirêj in:

Jimareyên bêjeyên hevokan	Jimareyên hevokan
2, 3, 4, 5	7
6, 7, 8, 9	14
10, 11, 12	12
13, 14, 15	7
16, 17	2
19, 20	2
21, 22	2

³ Gülsüm Cengiz, Çocuk ve Gençlik Kitaplarını Değerlendirme Ölçütleri: <http://www.kipitap.com/blog/cocuk-ve-genclik-kitaplarini-degerlendirme-olcutleri/>

(Anlatım, temiz ve akıcı olmalı; cümle, paragraf uzunlukları çocuğun yaşına uygun olmalıdır. Dil yalın ve doğal, dil tadını veren ve dil beğenisini ve bilincini geliştiren nitelikte olmalıdır.)

⁴ Selman Dilovan, Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mizah û îronî be divê zarokane be, Nûbihar, Hejmar, 116, Stenbol, 2011, r.66.

Wekî ku em di tabloya jorîn de dibînin ji van 46 hevokan de ên bêjeyên xwe deh û hîn zêdetir 25 in.

Ji van hevokan ên ji bîst bêjeyan zêdetir pêk tên jî hene.

Mînak:

Piştî ku mişkî çiyayî li rewşa pismamê xwe dipirse, ew tirs dikeve nav dilê mişkê feqîr û dibêje; -Qet nepirse pismam!

Ev hevok ji bîst û yek bêjeyan pêk tê. Evqas hevokên dirêj ronîkirin û fêmkirinê vegotinê re asteng e. Wextên ku zarok wê hevokê guhdardikin yan dixwûnin serê zarokan de tevlihevî çêdibe.

Vekolînên li ser bîra kurtedemî (short-term memory) ya mirovan selmandiye ku rêjeya peyvên/elementên ku mirov dikare di bîra kurte-demî de ragirenavînê 7 peyv in (du kêma du zede); gava ji vê reqemê zêdetir dibin yê pêştir pak dibin û yê nu tên.⁵

Dirêjîyên hevokan pêwîste ku gorî asta zarokan be, fesîh û rewan be.

Di çîrokê de hinek bêjeyên ku me tespît kirî, ne di asta zimanî/ê zarokande ye, lê ji aliyê “konseptên pêşketinê”⁶ de baş e. Ji ber ku zarok bêjeyên nû hîn dibe û ji aliyên zanebûna bêjeyan dewlemend dibe.

Bêjeyên ku me tespît kiriyî: *Debar, qewimî, garan, kerî*. Ev bêje ji zarokan re dijwar in. Nemaze ji zarokên “pêşdibistanê”⁷ re. Tevahiya çîrokê de ku em dinêrin bêjeyên dijwar nepir in. Di çîroka ku em vedikolin de teve sernavê 481 bêje heye. Di van bêjeyan de 4 bêjeyên dijwar me tespît kir. Ew jî nêzî % 1 e. Li gor vê pîvana bêjeyên nenas nepir in û ji bo ku zarok bêjeyên nû hîn bibin divê li gor asta zarokan hinek bêjeyên nenas hebin.

Ji bo rastnivîsînê û zimanekî standard bêjeya “*hev û din*” bi hev re bê nivîsîn. A rast “*hevûdin*” e.⁸ Bêjeya “*dûre*” cihê tê nivîsin yanî “*dû re*”. Lê belê gor standardîzekirinê “*di dû re*” ye.⁹ Xalbendî rêyê li ber şaştegihiştinê digire û alîkariya xwandevanan dike da ku ew mebesta nivîskaran rast fêm bikin.¹⁰ Çîroka ku em vedikolin de her çi xalbendî dîqet kirine jî, hinek hevokên têkel pê çêbûne.

Mînak:

Her du mişkan ji xwe re xwarin amade kirin, li ser sifreyê rûniştin û xarina xwe xwarin.

Mînaka ku li jor me dayî de 3 hevok hene:

⁵ Ramazan, ALAN, Ergin, ÖPENGİN(Ed.), Tîr û Armanç, Peywend, Stenbol, 2014, r.198.

⁶ Kavram gelişimi

⁷ Okul öncesi

⁸ M.Malmîsanij, Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî/Kurdancî-Tirkî, Rûpel, Stenbol, 2012, r.126.

⁹ M.Malmîsanij, Her eynî berhem, r.88.

¹⁰ Mistefa Aydoğan, Rêbera Rastnivîsînê, Rûpel, Stenbol, 2012, r.254.

⁽¹⁾*Her du mişkan ji xwe re xwarin amade kirin.*

⁽²⁾*Li ser sifreyê rûniştin.*

⁽³⁾*Xarina xwe xwarin.*

Her sê hevok bi bêhnok û gihanekê hatiye girêdane. Nehevce ye ku meriv dariştina hevokê nîsbeten dirêj û têkel bike.

Di çîrokê de hevokeke wanî heye: *Pismamê wî bi dîtina wî gelek kêfxweş bûbû.*

Hevok bi Çîrokiya Dema Boriya Nedyar hatiye çêkirin. Lê belê, nehewce ye ku meriv vegotina hevokê bi vê demê giran bike. Li gor tekstê hevokên paş û ên pêş ku em dinêrin, a baş hevok bi dema borî bê çêkirin.

Tespîtên li jor ku me bi çavê rexneyî kiriye ji aliyên vegotinên pak û durist re kêmayî ye. Bêguman fêmkirina hêsan û zelal hîn dîqetiyê dixwaze.

C- Vekolîna Piştgirîya wê ya li ser Geşedana Zimên

Çîrok, ji aliyê geşedana zimên ve roleke giring dilîzin. Ji aliyê guhdarikirin, xwandin, gotin û nivîsînê, zarokan pêşve dixin.

Di fêrbûna zimên de roleke xwe ya mezin heye. Bi vî awayî zarok hînî zimanê hawîrdorê xwe dibe. Ew bi tene hînî gotinan nabe, fêrî maneya wan jî dibe. Zimanê ku bi vî awayî hatiye fêrbûn zimanê dayîkê ye. Bi alîkariya vî zimanî zarok dikare fikrên xwe pêşve bibe, bi awayê têgihîştin û hêza xwe ve cihanekê dîyar bike û tiştên nû fêr bibe. Ji bo vê yeke mirov di zimanê xwe de dikare fikir, raman û hestên xwe bi awayekî baştir bîne zimên.¹¹ Çîrok ji berê û paşê de meharet û hunerên zarokan dewlemend dikin. Hiş û mejiyê zarokan pêş dixin. Zarok bi rêya çîrokan têgih û bêjeyên nû hîn dibin.

Çîroka ku em analiz dikin ji aliyên geşedana zimên ve zarok gelek sûd verdigrin. Lê belê, wekî ku me li jor behs kiriyê hevokên têkel û dirêj ji zarokan re alozî û sergêjiyeke zêde çêdikin, nahêlin ku hişmendî, meraq û zewqên wan bînin şûnê.

D- Vekolîna Naverokê

Hemû tekst/metîn, bi parçeyên tekstê(hevok û komepeyv) û yekitiya wateyê ve girêdayî ye. Ev parçeyên yekitiya tekstê, “naveroka tekstê” çêdike.¹²

¹¹ Ramazan, PERTEW, Zarok û Edebiyata bi Zimanê Zikmakî, Nûbihar, Hejmar, 116, Stenbol, 2011, r.55.

¹² Sıddık, Akbayır, Cümle ve Metin Bilgisi, Pegem A Yayıncılık, Enxer, 2006, r.215.

Her metin, anlam bütünlüğü oluşturan metin parçacıklarının(cümle ve cümle değerindeki birliklerin) toplamıdır. İşte bu metin parçacıklarının birliği “metnin içeriğini” oluşturur.

Naveroka çîrokê ku em dinerin ji aliyê destpêk, pêşketin û encamê ve ti pirsgirêk tine lê belê li ser encamê hîn sekinandin baştir e.

Naverokên çîroka ji aliyê motîfên çandî girîng in. Wek motîfên deşt, çiya, pismam, şivan ji çanda kurda ne. Motîf ji ber ku tesîra xwe li binehişîya zarokan dibe, zêdetir dîqet pêwîst e ku motîfên çanda biyanî nekevin çîrokên zarokê kurda.

Çîrok bêhtir xwediyê binyadeke dîdaktîk in. Di hemû çîrokan de aliyekî fêrkirinê, dersdanê û rindiya karakteran heye. Çîroka me de jî piştgirî, hêvî û hwd. xisletên rind hene. Herwiha ku meriv çîrokê dixwîne û tê dawiyê di hişê merivan de

Destpêka çîrokê wek formata çîrokên kurda bîst destpêkirin baştir e:

“Hebû, tunebû

carek ji caran

rehmet li dê û bavê guhdaran

bi tevî derî û cîranan

bi tevî pepûk û xizanan

bi tevî rêwî û koçberan

bi tevî sêwî û bêmalan

bi tevî birçî û nexweşan

bi tevî mişkên li dîwaran

Ji xeynî eza û mixtaran

ji xeynî Bekoyê Ewanan

ji xeynî Rom û Ereban

ji xeynî Papaxgeniyan

ji xeynî dizên xiyaran

ji xeynî dêvên keleman

Wî got, min got, we dot

Ba hat, bahoz hat, kêçên Bexdayê hat

Dengê dêvan hat

Şenglo birev bivirê

Menglo birêv tevîrê

Na na, devên xwe vekin çavên xwe bigirin

Yê hat Mişkê Deştê ye”¹³

Li deşteke mişkek û...

E- Vekolîna Peyama Çîrokê

Çîroka ku em vedikolin yek ji cureyên çîrokan yên ajalan e. Bi navekî xwe yê din fabl e. Ev çîrok qehremanên xwe ji ajalan distînin. Dixwazin meseleyên di jîyana xwe de bidin ber çavan û meriv dersekê jê bigirê. Ev cûreyên çîrokê kin û bi hereket in. Ji ber vê diqetê zarokan dikşîne, kêfî zarokan pê tîne. Bi rêya ajalan rindî û xerabiyê, xêrxwazî, merhemet, edeb û rûkenîyê bi zarokan dinasîne.

Seranserê çîrokê ku em dixwînin eşkere tişteke nakeve mejiyê meriv. Ji ber ku peyama çîroka me neyekser e. Lê belê ne şert e jî. Lewre peyama çîrokê bi zarokan hîskirin bidin û zarok bixwe peyama çîrokê derbixin baştir e.

Di çîrkê de tirsî mişkê deştî û fêdebûn/netirsî û pîştgirîya mişkê çiyayî derdikeve pêş. Mixabin her çiqas mişkê çiyayî netirs û jêhatiye jî hêz û derfeta xwe sînordar e.

F- Vekolîna Peyv û Komepeyvan

Di vê sernavê de bêjeyên di çîrokê de derbas dibin li gor asta zarokan em dê analîz bikin.

- 1- Ji aliyê Lêkeran
- a- Lêkerên Xwerû/Sade

Lêker, kar, tevger û kirina heyberan nîşanî mirov didin.

Lêkerên ku ji bêjeyekê pêk tên lêkerên sade ne. Ev lêker gor asta zarokane, fêmkirin ne zehmet e.

Bo nimûne: *hat-in, kir-in, her-în, bûy-in, dît-in, pirs-în, xwar-in, liv-în, wêr-în, ket-in, gerbêj-in, da-n, çû-(y)in, bîn-in, bû-n, tê-(y)în, girt-in, rev-în.*

¹³ Çîrok, <https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%AErok>

b- Lêkerên Hevedudanî

Lekerên ku ji du bêjeyan û zêdetir pêk tên lêkerên hevedudanî ne.

Hin lêkerên hevedudanî hene ku bi hevûdin ve dihên nivîsîn. Ev cureyên lêkeran bi pêşgiran û lêkerên sade yan bêjeyên din û lêkerên sade pêk dihên.

Bo nimûne: *gihîştin, rûniştin, qewimîn, derxistin, tevgerîn, pelêxîn, jêkirin, hilkişîn, derketin*

Hin lêkerên hevedudanî jî hene ku hevûdin cuda dihên nivîsîn.

Bo nimûne: *debar kirin, xwedî kirin, xelas bûn, xelas kirin, kêfxweş bûn, hembêz kirin, amade kirin, li hev şaş bûn.*

Ev nimûneyên lêkerên ku me li jor dayî, nemaze hin lêker ji zarokan re zehmet in. “*li hev şaş bûn*” lêkera hevedudanî ye û têgihîştina zarokan re ne zelal e.

Ji bo ku zarok fêhm bikin lêkerên hêsan bikar bînin baştir e.

2- Ji aliyê Navdêran

Nav ew tişt e ku li hemû tiştan tê kirin. Têgeh, term û hemû bûnewerên ku hene bi navan tên nimandin.

Deşt, mişk, malbat, kul, hal, debar, mal, zarok, feqîr, bela, fikir, pismam, çiya, bîr, roj, şev, kêfxweş, xatir, sifre, nebaş, bav, derî, dil, neyar, şêr, ker, guh, gur, diran, nişan, firavîn, gurmegurm, erd, jêhatî, Xweda, garan, kerî, pez, şivan, pisîk, gewr, çav, çîrok, diyar.

Wekî ku hun li jor dibînin gelek navdêr di çîrokê de derbas dibin. Hin navdêr di hevokê de rengdêr temsil dikin. Bo numûne: *feqîr, jêhatî, gewr.*

Piraniya navdêran sade ye lê yên hevedudanî jî hene. Bo numune: *malbat, debar, kêfxweş, nebaş, neyar, gurmegurm, jêhatî, Xweda, diyar.*

Navdêr çiqas şênber bin û yên razber kêmbin evqas baştir e. Çiku li gor distûra “şênber ber bi razber”¹⁴ ku em bêjeyan tehlîl dikin ji aliyên asta zarokan ti pirsgirêk nîne.

3- Ji aliyê Rengdêran

Rengdêr, navan li gorî reng, rewş, teşe, çawanî, cih hejmar û rêzê dinimînin. Rengdêr navan re têkiliyan xurt dikin. Ji ber vê yekê xeyalên zarokan jî geş dibin.

Di çîrokê de rengdêr ne pir in. Bo numûne:

Mişkê feqîr

¹⁴ Soyuttan somuta

Tiştêkî nebaş

Belayeke wisa

Pismamê xwe yê jêhatî

Mişkê deştê

Mişkê çiyayî

Ravekên li jor ku me nîşan kiriyê de tenê “pismamê xwe yê jêhatî” dirêj e û bê zarokan re zehmet be. Lê belê seranserê çîrokê de ji aliyên rengdêran ve tiştêkî dinî aloz û zehmet nê berçavan.

4- Ji aliyê Gihanekan

Gihanek; bêjeyan, komepeyvyan û hevokan bi hev ve girê didin. Di kurdî de gihanek pir bikêr in. Ji ber vê yekê di çîrokê de ku tevayî 46 hevok in, 26 hevokan de gihanek tên dîtin. Gihanek di hinek hevokan de jî yekê zêdetir in.

Bo numune:

^(a)*Mişkê feqîr nizanibû **ku** çawa bike **û** ji vê belayê xelas bibe.*

^(b)*Piştî **ku** hev û din hembêz kirin **û** li hal û xatirê hev û din pirsîn, derbasî malê bûn.*

^(c)***Ji ber ku** bavê wan çûye, newêrin serê xwe **jî** ji nav derî derxin.*

^(d)*Piştî **ku** mişkê çiyayî li rewşa pismamê xwe dipirse, ew tirs dikeve nav dilê mişkê feqîr **û** dibêje; -Qet nepirse pismam!*

^(e)*Pismamê wî yê çiyayî wekî **ku** ji tu tiştêkî natirse tevdigere **û** jê re dibêje; -Ew çi ye **ku** pismamê min ditirsîne?*

Helbet ji bo derbirîneke baş û hevokên rewan carinan gihanek derman in. Gelo hevok(d), (e) derbirînê hîn zehmet nake? Nehevce ye ku meriv hevokê bi gihanekan giran û dirêj bike.

Di çîrokê de gihanek “û” peyvên durengdêrî jî çêkirine. Bo numune:

kul û hal

roj û şevan

hal û xatir

Ev terkîbên li jor ku bi gihanekê hatine hevûdin e derfeta derbirîna zimên zêde kiriye. Gihanek bi van teşeyan, bi hevokên zelal û rewan û helbet bikêr in.

Yên ku em di çîrokan de diqet bikin pêwist e ku gihanek hevokan zelalî û herikbarîyê dût nexê. Dirêjiya hevokan jî asta fêmbariya zarokan de bê.

5- Ji aliyê Daçekan

Daçek ji cureyên bêjeyan ên erkî ne. Daçekên xwerû bi xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê di nav hevokê de beşên din ên peyvê ji aliyê wateyê ve sergihayî dikin. Dîsa daçek ji aliyê wateyê ve (wekhevi, dijberî, sedem, cih û bergek) di navbera peyvên de têkiliya wateyî pêk tînin.¹⁵ Ne tene daçekên sade/xwerû lê daçekên nesade û bazinedaçek jî hene. Li jêr em daçekên ku di hevokan de binêrin.

^(a) *Li* deştekê mişkek û malbata xwe dijiyan.

^(b) *Di* carekê *de* pismamê wî yê ku li çiyayî dijiya, hat bîra wî.

^(c) Tu *bi* min *re* were, ezê wî nîşanî te bidim.

^(d) Mişkê deştê *ji* pismamê xwe yê jêhatî *re* dibêje; -Pismam!

^(e) Her du *bi* hev *re*, *li ser* sifreya xwarinê rûdinên ku firavîna xwe bixwin, bi carekê gurmegurm ji erde diçe.

Hevok(a); daçeka sade, hevok(b), (c),(d); bazinedaçek, hevok(e); hem bazinedaçek hem jî daçeka nesade tê de ye. Hevokên li jor yêr ku me numûne dayî ji aliyên daçekan ve durist in.

Lê belê ku em numûneya li jêr binêrin:

Di peyî keriyê pezi *de* şivanek derdikeve û pisîkekî gewr jî pê re ye. (di pey...re)

Hevok(b)ji ber du tiştan nedurist e. daçek tewiyaye û li gor wateyê nerast e. Li gor qayîdeyê “Daçek natewin lê ditewînin.”⁽¹⁰⁾ (bnr. Aydogan, Mistefa, Rêbera Rastnivîsînê, Rûpel, 2012, r.221)daçeka *di peyî ... da, peyî* divê netewê û *pey* bimîne. Paşdaçek(*da*) jî bi paşdaçeka “*re*”yê re divê guhertin. Ango ku em daçekê durist bikin *di pey ... re* divê.

Ji ber ku daçek têkiliya wateya pêk tînin di kurdî de gor wateyê hevokê bêtir diqetê dixwazin.

6- Ji aliyê Cînavkan

Peyvên ku cihên navdêran digirin cînavk in. Di çîrokê de gelek cînavk hene.

Bo numûne:

^(a) Pismamê *wî* bi dîtina *wî* gelek kêfxweş bûbû.

^(b) *Tu* bi *min* re were, ezê *wî* nîşanî te bidim.

^(c) Heke gur be *ez* diranên *wî* hilkişînim.

^(d) Mişkê deştê ji pismamê *xwe* yê jêhatî re dibêje; -Pismam!

¹⁵ Sami Tan, Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011, r.187.

^(e)Mişkê çiyayî dibêje; Ka *ti* nîşanî *min* bide ku *ez* çawa ji heqê *wî* derdikevim.

Wekî ku hûn li jor dibînin hevokan de cînavkên(tarîkîrî û îtalîk) ji yekê zêdetir gelek in. Hele di hevok(e) de 4 cînavk hene ku ji hedî zarokan zêdetir derdikeve.

Dema ku nêzikî malê bû, dît ku pismamê wî ber pê tê.

Hevoka jor de cînavka ji grûpa tewandî yekjimar û nêr li ber çavan e. Li gor wateya hevokê em zanin ku pismam, pismamê mişkê deştê ye. Meriv bibêje “pismamê *wî*” nediyare ku pismam ê mişkê deştê ye. Ji ber van mînaqêşan cînavka vegerok (ku “*xwe*” ye) têxin hevokê baştir e. (*Dema ku nêzikî malê bû, dît ku pismamê xwe ber pê tê.*)

Helbet şûna şexsiyetan an tiştan cînavk bê bikar bin û zarokan re bê nasandin. Lê belê di çîrokê de ne ku ji 46 hevokan 32yan de hebe û pir hevokan de jî ji yekê zêdetir be. Ji ber vê yekê çîrok bûye sergêjîyê cînavkan e.

7- Biwêj û Gotinên Pêşyan

Di çîrokê de gotinên pêşyan nenivîsî ne. Yek hebûya û li gor asta zarokan di nav çîrokê xistina baştir bû.

Di çîrokê de du biwêj tîn berçavan. Ev jî li jêr hevokê de ne(tarîkîrî û îtalîk).

Di Belayeke wisa hatiye serê me ku Xwedê neyne serê neyarê min jî.

Mişkê çiyayî dibêje; Ka ti nîşanî min bide ku ez çawa ji heqê wî derdikevim.

Her du biwêj jî li gor asta zarokan e. Bi saya biwêj û gotinên pêşyan zarok tehma zîmanê xweyî zikmakî dibinin û ji zimanî xwe hîn hez dikin.

8- Awayê Peyvan li gorî Fêrkirina Zimanê Kurdî

Çîrokê de 481 peyv hene. Di her beşê de li gor asta zarokan û fêrkirina zarokan me rexne û pêşnîyazê xwe da ber çavan.

Naha jî em Ji aliyê geşedana çandî û asta fêmkirinê ve qineatên xwe rave bikin.

a- Ji aliyê Geşedana Çandî ve

Ji aliye geşedana çandî ve fonksîyona çîrokan balkêş e. Kesayetên merivan bi civakê re û bi çanda civakê re girêdayî ye. Çîrok ku ji ne çanda neteweya zarokan be divê kesayetîya zarokan ji aliyekî kêr bibe. Ji ber vê yeke bixwebawer jî nabin.

Çîroka me yê ku em vedikolin ji aliyên têgihîştina zarokan û çanda kurda ve ti pirsgirêk nîne.

b- Ji aliyê Asta Fêmkirinê ve

Wekî ku me berê jî gotibû divê hinek bêje ne li gor asta zarokan bin. Nemaze zarokên pêşdibistanê.

Bo nimûne:

Debar

Qewimî

Garan

Kerî

Divê ku ew bêjeyên li jor ku di hevokên xwe de tînin, wateyên hevokan nedin der.

G- Nirxwandina Giştî

Çîroka *Mişkê Deştê* ji aliyên zimên û uslûbê, geşedana zimên, naverok, peyvan û peyvan ve heta ji dest me hat me li gor asta zarokan ron kir. Kêmayiyê ku ber çavên me ketiyê me nirxwand û pêşnîyarên xwe nivîsî.

Helbet qusûrê heya ku diqeteke girîng dixwaze, divê sererast bibe.

Î- Ji Nû ve Sazkirina Metnê

MIŞKÊ DEŞTÊ

Hebû, tunebû. Carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, bi tevî derî û cîranan, bi tevî pepûk û xizanan, bi tevî rêwî û koçberan, bi tevî sêwî û bêmalan, bi tevî birçî û nexweşan, bi tevî mişkên li dîwaran; Ji xeynî eza û mixtaran, ji xeynî Bekoyê Ewanan, ji xeynî Rom û Ereban, ji xeynî Papax geniyan, ji xeynî dizên xiyaran, ji xeynî dêvên keleman... Wî got, min got, we dot. Ba hat, bahoz hat, kêçên Bexdayê hat, dengê dêvan hat. Şenglo birev bivirê, Menglo birêv tevîrê.

Na na, devên xwe vekin çavên xwe bigirin, yê hat Mişkê Deştê ye.

Li deştê mişkek û malbata xwe dijiyan. Mişk bi çî kul û halî be, mala xwe xwedî dikir. Zarokên xwe xwedî dikir.

Çî bû çawa bû; belayek hat serê mişkê deştê. Mişkê feqîr nizanibû ku çawa bike û ji vê belayê xelas bibe.

Mişkê deştê fikirî, fikirî. Di carekê de pismamê xwe yê ku li çiyayî dijiya, hat bîra xwe. Mişk ji xwe re fikirî û wiha got; -Ez ê herim cem pismamê xwe. Heke xelas bike, dê ew me ji vê belayê xelas bike.

Mişkê deştê berê xwe da çiyayî û bi roj û şevan meşiya.

Dema ku nêzîkî malê bû, dît ku pismamê xwe ber pê tê.

Mişkê çiyayî bi dîtina mişkê deştê gelek kêfxweş bû. Mişkê çiyayî û mişkê deştê gihîştibûn hev. Hevûdin hembêz kirin û li hal û xatirê hevûdin pirsin. Piştî derbasî malê bûn.

Her du mişkan ji xwe re xwarin amade kirin. Li ser sifreyê rûniştin û xarina xwe xwarin.

Mişkê çiyayî ji pismamê xwe pirsî; -Te xêr e pismam? Tu û van deran? Wisa xuyaye ku tiştêkî nebaş qewimiye.

Di vê navberê de zarokên mişkê deştê ji tirsan nikarin ji cihê xwe bilivin. Ji ber ku bavê wan çûye, newêrin serê xwe jî ji nav derî derxin.

Mişkê çiyayî li rewşa pismamê xwe dipirse. Tirs dikeve nav dilê mişkê feqîr û dibêje; -Qet nepirse pismam! Belayeke wisa hatiye serê me ku Xwedê neyne serê neyarê min jî.

Pismamê wî yê çiyayî wekî ku ji tu tiştêkî natirse tevdigere û jê re dibêje; -Ew çi ye ku pismamê min ditirsîne? Ka bibêje! Heke şêr be ez wî bipelêxim! Heke ker be ez guhên wî jêbikim! Heke gur be ez diranên wî hilkişnim.

Mişkê deştê dibêje; -Na na pismam ne yek ji wan e jî. Tu bi min re were, ezê wî nîşanî te bidim. Her du bi hev re dikevin rê û ber bi mala mişkê deştê ve diçin. Piştî çend rojan digihîjin malê. Dema ku zarokên mişkê wan dibînin, gelek kêfxweş dibin.

Her du bi hev re li ser sifreya xwarinê rûdinên. Ku firavîna xwe dixwin, bi carekê gurmegurm ji erdê diçe. Her du jî li hev şaş dibin. Mişkê deştê ji pismamê xwe yê jêhatî re dibêje; -Pismam! Bi Xwedê hat! Mişkê çiyayî dibêje; Ka ti nîşanî min bide ku ez çawa ji heqê wî derdikevim.

Her du derdikevin derve, dibinin ku garanek ji wir ve tê. Mişkê çiyayî dipirse; -Ev in? Mişkê deştê dibêje; Na, ne ev in!

Dûre keriyê pezî ji wir ve tê. Dîsa dipirse; Evin pismam? Mişkê deştê dibêje; -Na na, ne ev in!

Di pey keriyê pezî re şivanek derdikeve û pisîkekî gewr jî pê re ye. Mişkê deştê dibêje; -Ha ha! Pismam ev e! Mişkê çiyayî çavên xwe digire, direve û dibêje; -Pismam min tiştêk nedîte, Pismam min tiştêk nedîte!

Çîroka me li diyaran, rehmet li dê û bavên we guhdaran.

Encam

Çîroka ku em li ser dixebitin ji cureyên çîrokan ên ajalan e. Bi navekî xwe yî din fabl e. Ev cure bêhtir dîdaktîk in, dixwaze dersekê merivan de. Ji ber ku lehengên van çîrokan ajal in û wek merivan dipeyîvin, diqetê zarokan dikşîne, û kêfê zarokan pê tîne. Herwiha çîrok bi şêweyeke pêkenokî jîyaneke rasteqîn ku her tiştekî hêzeke xwe heye, li hişên merivan dixê.

Çîrok aliyên sentaksê û fêmbariyê ve hinek kêmayiyê xwe hene. Lê belê ev kêmayiyê ku me behs kiriyê, bêhtir diqetê tînan çareserkirin.

Çîrokê ku em gelemperî dinirxînin, çîrok fêmbar e, bilî çend peyv û hevokan zarok jê aciz nabin.

Vê xebatê de ziman û vegotina çîrokê, naverok, peyam û sentaksa metnê heta ji dest me hat me tehlîl kir. Pirtûkên zarokan ne tenê naverokê ve ji aliyên teşeyê ve jî girîng e. Ji ber vê sedemê divê berhemên zarokan ji aliyê teşeyê ve jî bê tehlîlkin.

Çavkanî

AKBAYIR, Sıddık, , Cümle ve Metin Bilgisi, Pegem A Yayıncılık, Enxer, 2006.

ALAN, Ramazan, Ergin ÖPENGİN(Ed.), Tîr û Armanc, Peywend, Stenbol, 2014.

AYDOĞAN, Mistefa, Rêbera Rastnivîsînê, Rûpel, Stenbol, 2012.

CENGİZ, Gülsüm, Çocuk ve Gençlik Kitaplarını Değerlendirme Ölçütleri:

<http://www.kipitap.com/blog/cocuk-ve-genclik-kitaplarini-degerlendirme-olcutleri/>

Çîrok, <https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9rok>

DİLOVAN, Selman, Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mizah û îronî be divê zarokane be, Nûbihar, Hejmar.116, 2011.

GÜREL, Zeki, Fahri Temizyürek, Namık Kemal Şahbaz, Çocuk Edebiyatı, Öncü Yayınları, Enxer, 2007.

M.Malmîsanij(Ed), Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî/Kurdmancî-Tirkî, Rûpel, Stenbol, 2012.

PERTEW, Ramazan, , Zarok û Edebiyata bi Zimanê Zikmakî, Nûbihar, Hejmar, 116, Stenbol, 2011.

TAN, Sami, Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011.

Weşanên Aram, Mişkê Deştê, Stenbol, 2012.

T.C
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

**ÇOCUK EDEBİYATI AÇISINDAN BİR MASALIN
İNCELENMESİ**

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

Zeki TEMEL

13721252

Danışman

Ramazan PERTEV

Mêrdîn - 2016